**Zarukan her ji Salroja êkê u heta temenê destpêka Qutabxanê, maf heye ku seredana Melbendên KITA yan jî li Senterên sexbêriya zarukan biken.**

**Çima Senterên sexbêriya Zarokan bo Zarokê min başe?**
Ew Zarokên ku Zimanêelmanî hîç nizanin yan jî baş nizanin, wê li vêrê zû Zimanêelmanî fêr bibin, di rêka yarîkan ligel Zerokên wê gelek şiyanên giring videst ve bînin, jibo Minak: Reçawkirn u Serederî u Çareseriya pirsgirêkan. Ev Zaniste wê harîkarbin jiboî berhevkirna Zarokê we bo Qutabxanê.
Çaxê Zarokê we dihête sexbêrî kirin, dê we weke dayk u bab Kat hebî, bu Minak ku hun bixwe Fêrbibin, herin Kar, Karên navmalê encam biden.

**Deriyê me jiboî her Xêzanekî yê vekiriye!**
Li KITA yê, Hunê Dayk u bab u Zarukên nû nas biken, her Xêzanek bi Xêrhatiye li cem me. Eger te pêşniyar hebin yan jî te fikar u endîşe hebin, li gel Perwerdekar u Sexbêrîkaran derbarey hindê biaxivin.

**Kengî KITA destpêdike u kengî bi dawî tê?**
Ev girêday her KITA îkiye, ka çend Wext heye u çend Cih heye, Hindek KITA cih hene ku jiboî temamî Rojê ye, hinek ajî cih hene jiboî danê Spêdê „Berî nîvro“ yan jî Piştî Nivro.

**Xiwarin heye jibo Zarokê min?**
Li barapitrî KITA, Demên diyarkirî hene jibo „Taştê“ Nanê spêdeîya u „Firavînê“ Nanê nîvro. Pirsiyar bke, aya Gereke bo „Taştê“ Nanê spêdeîya jibo Zarokê xwe ligel xwe bînî, yanjî ewê li wir boberhev biken. Daxiwaziyên taybet yan jî derbarey Xiwarnê, dikarî ligel Perwerdekaran, wate Sexbêrîkaran biaxivî.

**Dayk u bab dikarin li KITA yê Çi biken?**
Dayik u bab bi şêweyekî „çalak“ Aktiv di Jiyana rojane ya KITA yê da beşdarin, bo Mînak li rêkxistna Ahengan, berdewam kumbun u Axêftin çê dibin, dikarî derbarey Zarokê xwe ligeg desteya Parwerdeka biaxivî.

**Ezê çawa reftar bike li detspêka KITA yê?**
Li destpêkê tu wê bihevra ligel Zarokê xwe di Grupê da bimînî, heta ku Zarok digehîte Astekî ku bi tenê ligel Zarukan bimîne, demê cudabuna te li gel Zarokê te, piştî dan u sitandin li gel Perwedekara Grupê wê bihête Encam dan.

**Ezê çawa KITA vebibînim u çawa Zarokê xwe lê navnivîs bikem?**
Li dewruberê nêzîkî Mala xwe li KITA yek hajî bigere u rastewxu here wir derbarey Navivîsê bipisre. Zaniyarî derbarey KITA yên Cîyawaz jî „Ofîsa Cewanan“ Jugendamt jî didet.

**Xerciyê Sexbêriyê li KITA yê çende?**
Xerciyê KITA u Xiwarnê di ciyawazin, Ew Dayk u babên rewşawana ya diravî kêm, dikarin harîkariyê werbigrin u li hnidek Cihan jî KITA bi belaşe. watê bêy Pereye.

Gefördert vom:
Bundesministerium für Familie, Senioren, Frauen und Jugend

**Nav u Nîşan**

Kurmandschi




# Zaniyarî derbarey sexbêriya Zarukan

nifbe Niedersächsisches Institut für frühkindliche Bildung und Entwicklung





Illustration: Anna Budina

# Jiyana Rojane ya KITA Çawaye?

Leyistin, Xiwarin, Nivistin, Werziabedenî, Xiwandin, Nîgarkêan, Fêrbûn, Kenîn, Strîn Afirandin, Geriyan, Hevalînî, Ahenggêran

**Li kuderêdin Zarurê min dê hête sexbêrî kirin? Ligel KITA yê „Kindertagespflege“ wate sexbêriya Rojaneya Zarokan jî heye, Ev mîna Xêzanek biçûke u barapitir ji boî Zarukên li jêr Sê saliyêda ye, ji bo pitir pêzanînan seredana wî Malpery biken www.bktp.de**